Mesûd Barzanî: Spaha Pasdaran û Heşda Şeibî bi çekên Amerîkî êrîşî ser Kerkûkê kirin

»»» R:7

Gelo Kurd tenê bes e ji Kurdbûna xwe xwedî derkevin

»»» R:3

Çima alaya Kurdan raştî bêrêziyê tê

»»» R:4

Rêkkeftina Şingalê û kartêkirina wê li ser Rojavayê Kurdiştanê

»»» R:8

Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (384) 23-10-2020 Buha (1000) Tûmen

Rejîma Îranê çavkaniya gefê ye li deverê

Serokê "Şêvreya Hevkariya Kendav"ê raghihand: "Îran di deverê de hewla tundûtîjiyan dide, û ji aliyê perewedekirin û dabînkirina malî û şandina çek û cebelxaneyan, piştevaniyê ji girûpên terorîstî di welatên "Îraq, Yemen û Sûriyê" de dike".

Roja Sêşemî 29`ê Rezberê (20`ê Çirriya Pêşîn) Serokê "Şêvreya Hevkariya Kendav"ê, "Nayîf bin El-Fellah El-Hucref" gotiye: "Îran bi dujminatîkirin û afirandina tundûtîjiyan di deverê de dixwaze bigihîje armancên xwe yên siyasî".

Pêka gotinên "Nayîf bin El-Fellah El-Hucref", hejmarek ji welatên deverê ku endamê "Şêvreya Hevkariya Kendav"ê ne, bi awayekî berdewam ji aliyê rejîma Îranê û hêzên girêdayê Îranê ve bûne armanca mûşek û rakêtan.
Eva piştî vê yekê hate gore, ku li roja Duşemî 11`ê Çirriya Pêşîn balyozê Erebiştanê di Saziya Neteweyên Yekgirtî de, "Ebdullah El-Mo`ellimî" ragihandibû: "Îran bi piştevanîkirin ji girûpên çekdar di deverê de biryarnameyên Navnetewî binpê dike" û herwisa gotibû: "Em bi girîngî dizanin ku mêzeyê wan hewlan bikin ku bi armnaca jinavbirina çek û cebelxaneyên navikî yên rejîma Îranê bi taybet di Rojhilata Navîn de bi rê ve diçin".

Herwisa li ser wê mijarê, roja Yekşemî 27`ê Rezberê, Wezîrê Derve yê Amerîkayê "Mike Pompeo", ragihandibû: "Ee kes û aliyên ku çekan difiroşin Îranê, an di veguhastina çek û teqemeniayn de alîkariyê bi Îranê re dikin, emê wan raştî dorpêçan bikin".

Piştî gotinên navbirî, Wezareta Derve ya Amerîkayê 2 kes û 6 damezraweyên Çînî, bi sedema binpêkirina tehrîm û biryarên Amerîkayê û pêwendî digel hêla veguhastin ya kompaniya keştîranî ya rejîma Îranê xiştine nav lîştê reş yên terhrîman.

Ji aliyekî din ve jî nûnerê taybet yê Amerîka bo karûbarên Îranê, "Elliott Abrams" ragihandibû: "Me li dijî wan kesên ku girêbeşta wn derheq çek û cebilxaneyan digel rejîma Îranê hebe, tehrîmên taybet bo danîne", pêka gotinên "Elliott Abrams" Amerîka li benda vê yekê nîne ku di encama hiloşandina tehrîman, Komara Îslamî bikare çek û cebilxaneyên nû peyda bike, belkî hemû hewlên Amerîkayê eva ye ku pêşî ji deştpêragihîştina rejîma Îranê bi çekên pêşkevtî bigre.

Her di vê derheqê de Wezîrê Berevaniyê yê Amerîkayê ragihand: "Bo welatên Rojhilata Navîn derketiye ku mezintirîn gef li ser aştî û aramî û asayişa deverê, çalakiyên alozker û fitneyên rejîma Îranê ne".

Encama wan bas û daxwazên ku hatine kirin, di çarçoveya siyaseta givaşê ya herî zêde ya Amerîkayê tê binavkirin, û nîşan didin ku paşeroja rejîma Îranê şêlû ye, ku tê de givaş digihîjne bilindtirîn aşta xwe.

Givaşên ku wekî piraniya çavdêran jî bas kirine, bersiva wê pirsiyarê jî dide ku aya rejîma Îranê wê biguhere? Pêka gotina beşek ji çavdêrên siyasî, givaşa herî zêde ya aborî ku binyata jiyan anku aboriya Îranê kiriye armanca xwe, hevteraz digel bilindtirbûna nerizayetiyên civakî û siyasî, bi hev

re îradeya giştî di hundirê civaka Îranê de afirandiye, ku wê temenê rejîma Îranê bi dawî bîne.

Xuya ye ku îşare bi vê yekê tê kirin, ku ew kiryarên berbirûbûnê bê dana nirx nabe, û renge nirxeke gelek giran jî hebe. Çimkî Komara Îslamî wê berteka taybet bi xwe hebe ku di rewşên wiha de, rejîmê deşt ji serkuta hovane ya neraziyan û xwazyarê jinavbirîna rejîmê naparêze, lê xelkê bêzarbûyî yên Îranê, amadeyî dana her nirxekê ne, çimkî azadî û kerameta mirovî ya xelkê hatiye binpêkirin û wan ti hêviyek bi paşerojê nemaye.

Sergotar

Merg û Erk

N: Kerîm Perwîzî

Dema ku hêzên serkutker yên rejîmekê bi doşkayê di nav bajarekî de destrêjiyê dikne ser xelkê û bi sedan û hezaran gurdanên Îmam Elî dişînin nav kolan û şeqaman de, ku xelkê bi awayên dirindane bikujin, ew rejîme bi rohnî û bi eşkere dibêje ku, ew bi her awayî di pêxema mana "Weliyê Feqîh" û nizamê de, tev mirovan dikuje û amadeyê encamdana her cure komkujî û cînosaydekê ye.

Ew rejîme ger erdhej û lehiyek biqewime, bi hawara xelkê de naçe, da ku dijwarî û azarên zêdetir bikêşin û malvêraniya zêdetir bi ser xelkê de bê, çimkî ji hemû derfeteke mifahê werdigre bo tolhildan li xelkê.

Li gor dîtina wê rejîmê û li serveyî hemûyen Xamineyî bixwe, dujmin pêk tê ji xelkên Îranê û neteweyên akincî yên wî welatî, lewma jî berdewam dûpat dike ku dujmin mijûl e nifûzê dike nav welat de! Li gor dîtina wê rejîmê, tev xelk dujmin in, û dibe bi her awayekî be, bêne kuştin.

Niha vîrûsek hatiye û bûye nê`imetek bo Xamineyî da ku hemû xelkê pê ceza bikin. Vîrûsa Korona ew belaye ye ku rejîma axûndî wê vîrûsê zêdetir bi ser xelkê de belav dike û berfirehiyê died, û bi ser xelkê de dibarîne û mergê wan bo wan bi diyarî tîne.

Di tev cîhanê de welat ber bi kontirola Koronayê ve diçin, lê ew rejîma xwînmij hemû meh û heftiyekê rikurda tûşbûn û kuştiyên Koronayê dişkîne û bi rohnî xuya ye ku rejîm dixwaze xelkê zêdetir bi Koronayê bimrin û dixwaze civatgê pê wê vîrûsê bêxe qedeman.

Niha ku Korona bûye çekeke vîrûsî bi destê rejîma "Filayeta Feqîh", bo berengarî di şerê dijî wê mîkrobê û komkujiyê, erk e li ser milê civatgehê ku berxwedanî û xweragiriya netewî û civakî rabigihînin û di rastî de dijberiya Koronayê, dijberiya tev rejîma "Wilayeta Feqîh" e.

Hemû netew di Îranê de dibe şerekî seranserî digel êrîşa mîkrobî ya rejîmê wate Korona rabigihînin û xweragirî û xweparêzî li mirina Koronayê xweragirî ye li hember rejîmê ku dixwaze tev civatgehê tûşê mirineke dirindane bike, û di rastî de toleya nerizayetî û xwenîşandana xelkê bi mîkroba Koronayê hildide.

Şerê civatgehê li hember mirina Koronayê, erkek hewce ye dibe li şerê li dijî Koronayê bo hevpêwendiyên civakî û xwerêkxistin û di beşa dawî de jî berevaniya seranserî ya netewan dij bi "Wîlayeta Feqîh" veguheze qonaxeke din, û Xamineyî û Koronayê bi hev re bavêjin nav kirsdanka dîrokê de!

Peyama pîrozbahiya PDKÎ bo "Mistefa Ozçelîk"

Dezgeha Pêwendiyên Giştî ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi boneya hilbijartina "Mistefa Ozçelîk" wek Serokê Giştî yê Partiya Azadî ya Kurdistan-Bakur peyameke pîrozbahiyê bo wê Partiyê şand.

Deqa peyamê wiha ye:

Birêz "Mistefa Ozçelîk", Serokê Giştî yê Partiya Azadiya Bakûra Kurdistan

Tevî silav û rêzên şoreşvanî, û bi hêviya saxî û silametiya we

Hevalê hêja!

Em haydarê lidarxistina duyemîn kongireya Parriya şoreşvan a we bûn ku bo cerek dinê, wekî Serokê Giştî ê Partiyê, baweriya nûner û endamên rêberiya Partiyê bi we hat bexşîn. Bi vê boneyê, em bi hewce dizanin ku li ser navê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, pîrozbahiyên herî germ ji we yên rêzdar, endamên rêberiyê û hemû alîgir û hezkiriyên partiya xebatkar a we bikin û hêviya serkevtinê li cibîcîkirina biryarên kongireyê û pêngavên neteweyî ên we di pêxema misogerkirina armancên siyasî û netewî ên gelê Kurd li Bakûrê Kurdistanê de dixwazin.

Di dawiyê de, carek din ji we pîroz be.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê

Dezgeha Pêwendiyên Giştî

Mihemednezîf Qadirî

Gelo Kurd tenê bes e ji Kurdbûna xwe xwedî derkevin?

N: Nûredîn Sofîzade

Di dîroka netewa Kurd de gelek mijar hene ku dema mirov jê dinêre û jê difikre, hemî dibine mînak û ders hem di warê bandora erênî û hem nerênî, mixabin şaşitiyên mezin ji aliyê Kurdan ve hatine kirin û hin ji wan şaştiyan bûne adet û rêbaz.

Bi dirêjiya dîroka Kurd û Kurdistanê, ku dijmin û neyaran cehd kirine ku wê netewê ji nav bibin û bihelînin û bikine parek ji xwe û Kurdbûnê ji bîra wan bibin, vê yekê wisa kiriye ku gelê Kurd ne tenê fikra rizgarî û serbestiya serxwebûnê û çêkirina dewleteke bo xwe neket, belkî tenê eva yeka zaniya ku xebatek hewce ye ku bikare xwe di hember asîmilasyona li ser xwe bisekine û ji nav neçe.

Mixabin givaşa ji aliyê dujminan ve bo ser Kurdan wisa kiriye ku bo heyamekî dûr û dirêj tenê mijûlê xweparastinê bin da ku ji nav neçin, lewma dijminên wekî Tirk û Ereb û Farsan, gelek bi başî seh bi wê rastiyê kiribûn, lewma wekî stratêjî û pîlanekê di hember Kurdan de siyaseta asîmîlasyonê girtine bera xwe heta ku Kurdan bi şerê xweparastinê ve mijûl bikin da ku fikrê ji serbestî û bidestvegirtina mafê qedera xwe nekin, û wê siyasetê gelek bandor dana ser xebata Kurdan.

Herçiqas hekî heya niha jî gelê Kurd zindî maye û dixebite û serê xwe di hember dijminan de neçemandiye, renge di cihê xwe de gelek girîng û bi nirx be, lê eva bes nîne û gelê Kurd divê di cihê şerê xweparastinê, şerê gihîştina bi rizgariya netewî bikin.

Kurd divê bi awayekê taktîka xebata xwe biguherin ku ne tenê qina`etê bi şerê xweparastinê ku nav jê danane berevaniya rewa bike, belkî hewce ye her bi xwe xwedî sitratêjî û pilandarêj be da ku hem bersivek be bo pîlan û taktîka helandin û bêdengkirin û asîmîlasyona dijminan li ser xwe, hem jî bixebite û şerê avakirin û çêkirina kiyana netewî bike, bi curekê ku Kurd bikare dijminên xwe di rewşa êrîş û pîlanan, bêxe rewşeke berevaniyê.
Renge eva jî bibe pirsyar ku gelo Kurd çawa dikare karekî wiha bike?

Bo bersiv dana bi wê pirsyarê ku renge cem gelek kesan hatibe pêş, hewce ye Kurd wan çend rêkan bigre bera xwe, ku ezê di berdewamiya wê nivîsînê de amajê pê bikim ku ew in: Netewesazî- Nîştmansazî- dewletsazî.

Bi raya min ew 3 warane jî tiştek nîne ku Kurd nekarin bikin.

Netewesazî- Dema ku Kurdan di her çar perçên Kurdistanê de cehd kirin, yekîtiyekê di nav xwe de çê bikin û hêla xebata netewesaziyê bi çêkirina yek gotariya siyasî û çêkirina Tioriyekî netewî bona bidestveanîna mafê qedera xwe di awayek ji awayên mafê çarenivîsa netewî, wekî serbixweyî, fîdralîzm, xudmoxtarî, otonomî, xwebirêveberî, mafê çandî û...hwd ne, eva ku her part û rêkxistinekî Kurdan cure rêbazek û tioriyek û siloganek girtibe bera xwe ku digel hev di dijberiyê de bin, bê guman nebûna yek gotariya Kurdan li ser mafê qederê, gelek xizmet bi pîlanên dijminan kiriye. Dema ku Kurdan cehd kirin ku bi parastina ziman û çanda xwe bi pîroz zanîna nîşanên netewî wekî ala û sembolên xwe xwedî derkeve û li ser bête cihab, bê guman eva jî hesta netewî dibe serê û dibêjne wê yekê "Netewesazî".

Nîştimansazî- Dema ku gelê Kurd karî li ser axa Kurdistanê li hev bikin, dema ku cugrafiyaya Kurdistanê diyarî kirin, herçiqas ku di serdemê dagîkariyê de be jî, dibe Kurd bizanin û sax bin

ku Kurdistan kîderê heya kîderê ye, dema ku Kurd di xema axa xwe de bûn, xema jîngeha Kurdistanê de bûn, dema ku cihwarên dîrokî yên xwe biparêze, dema ku hemî akinciyên Kurdistanê hevniştîmaniya xwe bizane û kêmaniyên xeyrîKurd jî ku di Kurdistanê de ne bêxe nava xebata xwe, bê guman ev "Nîştimansazî" ye.
Dewletsazî- Dema ku Kurdan seh bi wê yekê kirin ku dibe dewleta xwe hebin, dema ku Kurdan bi hemî cudahiyên cugrafiyayî û çandî û devokî hevdu qebûl kirin û amade bûn digel hevdu kar bikin, dema di her cihekê de derfet hebe Kurdan karîn sazî û damezrawên birêveberî û karê fermanberî bikin, dema ku her dîplomatekî Kurd xwe westand û her deriyek kuta da ku piştevaniya navdewletî û bîhaniyan bo netewa kurd rabikêşe, bê guman eva pêngava ceribandina "dewletsaziyê" ye û dijim jê dibe`ecin.

Gelê me yê Kurd heya niha gelek bi başî kariye şerê xweparastinê bike, her lewma ye jî heya niha wekî neteweyekî zindî maye û berdewam e, lê êdî eva têrê nake û hewce ye gelê me cehda avêtina pêngav bi pêngavan be bona gihîştina bi wan 3 xalên serve an ku Netewsazî, Nîştimansazî û Dewletsaziyê .

Bê guman hingê ye ku em dikarin bêjin gelê Kurd stratêjiya xwe bona gihîştina bi daxwazên netewiye xwe guheriye û hivîdar bin ku dê ji derbasbûyî baştir bibe.

Çima alaya Kurdan rastî bêrêziyê tê?

N: Dara Natiq

Ala yek ji hêma û sembola nasîna her neteweyekê ye û pîrozragirtina û parastina wê sereweteke xwezayî ya gelên cîhanê ye.

Gelê Kurdistanê jî yek ji wan netewa ne ku xwedî Ala xwe ya rengîn e û gelek qurbanî daye bo parastina alaya xwe ku bi dirêjahiya dîrokê li tevaya Kurdistanê bi çend qonaxên cuda de derbas bûye.

Ala ji bo neteweyan emaneta şehîdên wan e. Di dîrokê de tev netew û gelên cîhanê bi xwîna şehîdên xwe ala xwe li ser erdê xwe bilind kirine û di pêxema pîrozragirtina wê de xebat kirine û cehid kirine. Kurdistan jî mînakek e ku bi dirêjahiya xebata rizgarîxwazî ya Kurd bi hezaran şehîd dane û tevger û xebata xwe berdewam kirine da ku ala xwe li ser erdê bav û kalên xwe de bilind bikin û di saya wan şehîdan û berdewamiya bizava azadîxwazî ya Kurdistanê de Başûrê Kurdistanê hatiye rizgarkirin û ala rengîn di axa azad de diheje.

Ala sembola serxwebûn û serbestî û rûmeta her neteweyekê ye. Ti netewek tine ku di bin ala dagîrker û neteweyên din de bi azadî û serbestî bijîn. Mînaka herî mezin Bakur, Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê ne. Ala tê wateya hevgirtin û yekîtiya gel û xwedî heybetek mezin e di nava netewe de. Ala tê wateya desthilatdarî û xweseriya neteweyan ku îro Başûrê Kurdistanê di bin wê alê de li ser axa xwe desthilatdar e. Divê her Kurd xwedî li ala Kurdistanê derkeve.

Ala Kurdistanê li yekem kombûna damezirandina rêkxistina Xoybûnê de li sala 1927`an weke Alaya Kurdistanê biryar li ser hatibû dan.
Heman Ala, li sala 1919 Komeleya Rêkxistina Civaka Kurdistanê li Stenbolê ji alîyê komek ji rûnakbîr û sîyasetvanan hatbû damezirandin.

Kameran Bedirxan, Ji malbata Bedirxaniyan, ew Alaya li sala 1919 weke alaya Kurdistanê nîşanî welatên Ewropayê dabû. Di sala, 1927-1930î de Serokê serhildana Agirî, Îhsan Nûrî Paşa li ser çiyayê Agirî Ala Kurdistanê bi destê xwe diçikîne.

Dema ragehandin û damezirandna Komara Kurdistanê li sala 1946`an li Mehabadê heman ew ala bi hinek guhertinên biçûk bi destê Pêşewa Qazî Mihemed Serkomarê Kurdistanê ve hate bilindkirin. Pêşewa Qazî Mihemed, beriya şehadeta xwe, Alaya rengîn radestî nemir Mela Mistefa Barzanî dike. Lê wesiyet dike û dibêje, “gerek tu bi dil û can, Ala rengîn biparêzî. Ew Ala or-

jînal, îro li Kurdistana Başûr e û hejî tê parastin.
Kurd gerek ji bo dîrok û paşeroj û kevneşopiya xwe li Ala Kurdistanê xwedî derkevin. Bi taybetî gerek milletê Kurd, Ala xwe bi ruhekî niştimanperwerî û bi zanayî li zarokên xwe bidin naskirin û hezkirin.

Hezkirina Ala rengin, gerek di nav erkê neteweyî de di cîhê yekemîn de bê girtin.
Jiber ku Ala rengîn nîşana hebûna netewa Kurd e, ew şan û şerefa netewa Kurd e.
Yê azadiyê bixwaze dibê ji bo wê bixebite û tekoşînê bike. Azadî û serxwebûn pir xweş e. Serxwebûn xweş e li vê dinyayê em Kurd jî bibin xwedî dewleteke serbixwe. Ala rengîn li ber Neteweyên Yekgirtî di nava alên welatên din de bihê hildan pir xweş e. Lê tiştên xweş bi xwe çê nabin, dibe merov ji bo dîtina tiştên xweş bixebite.

Wek her neteweyekê me kurdan jî çendîn sembolên netewî hene, bixasmanî Ala rengîn û sirûda neteweyî. Herdu jî şerefa me û sembolên hebûna û yekîtiya me ne. Lema jî dibe em li hemberî sirûda netewî û Ala xwe bi hurmet bin û jê xwedî derkevin. hûn dibînin ku her car û bi hinceteké dagîrkerên Kurdistanê bi handana alîgir û morîdên xwe bê hurmetiyê bi ala û pîroziyên Kurdistanê dikin û dişevitînin û binpê dikin. Di çend rojên borî de jî li bajarê Bexdada paytextê Îraqê û ji aliyê girûpa girêdayê Îranê ya bi navê “Heşta Şeibî”, bo cara çendan bêrêzî bi Ala Kurdistanê hate kirin û car din bi wî karên xwe yên nemirovane hesta gelê Kurdistanê birîndar kirin. eva di demekê de bû ku şewitandin û binpêkirina Ala kurdistanê berçavê hêzên ewlehî dihate kirin, bêyê ku ti pêşgîriyek bi kiryarên wî karî were kirin. Ew karê han rats dijî eqlaniyet û destûra bi hev re jiyana aştiyane û birayane ya di navbera gelên Îraqê ye ku li gor zangona bingehîn a wî welatî lihevhatin li ser hatî kirin.

Bêşik dewleta Îranê rola serekî ji aliyê girûpên girêdayê xwe ve bo organîzekirin û bê hurmetîkirin bi pîrozî û sembolên Kurdistanê û çandina tovê natifaqiyê di navbera netewa Kurd û Ereb de dilîze. Ew karê han vê rastiyê dide eyanê Ku îradeya şoreşvanî û azadîxwazî ya gelê mafxwaz yê Kurd herwisan qayîm û bi bandor di rojev û çepera berxwdanê de ye. Moral û berdewamiya neteweya Kurd li ser mafên xwe yên berheq dagîrkerên Kurdistanê xistine tengasî û serî li wan aloz kiriye. Siyaseta asimîlekirin û bêrêzîkirin bi sembol û pîroziyên Kurdan ti car nekariye îradeya şoreşgêrî û mafxwazî ya neteweya me sist û lawaz bike. Gelê Kurd her li ser pê xwe ye û tekoşîna xwe heta gihîştin bi serkevtin û derxistina tev dagîrkerên Kurdistanê li ser axa bav û kalan wê bimeşîne.

Gelo bila xelk li cihê nan kêkan bixwin?

N: Elî Munezemî

Rewşa xelkê di Rojhelatê Kurdistanê de ku di bin zilma dagîrkerên Îranê de dijîn, roj bi roj aloztir û bizehmettir dibe. Di heyamê wan çend mehên derbazbûyî de, nebûna ard bo nanpêjan bûye sedem ku di piraniya bajarên Rojhelatê Kurdistanê de nan dest xelkê nekeve û rewşa jiyana wan di serdema nesaxiya Koronayê de li berê zehmettir û nexweştir be.

Rejîma Komara Îslamî ya Îranê li ber siyasetek şaş ya derheq werzêran û kirîna genim bi erzanî li werzêran, bûye sedemê vê yekê ku werzêr dest li berhemanîna genim berdin. Jiber ku dahata wan heta qasekî zêde li ew xerc û zehmetiyên ku bo berhemanîna genim dikşandin, kêmtir bû. Di demekê de xelkê Kurd di Rojhilatê de mane bê ard û nan ku Rojhilatê Kurdistanê yekek li cemserê here girîng di berhemanîna genim de ye. Rejîma dagirker a Îranê piştî projeya xwe ya bo «aboriya berxwedanî» (Iqtsad Miqawimetî), genim li destê werzêrên Kurd bi erzanî dikire û bo rojên xwe yên reş paşkevt dike.

Bo wan ne tenê birsîmana xelkê di Kurdistanê de, belkî man û nemana wî xelkî jî ne girîng e û bi micid siyasetên xwe yên dagîrkarî li hember gelê me di Rojhilatê de dimeşînin û wan bo aliyê tunekirinê dibin. Wan pergala xwe ya desthilatdariyê bi awayekê damezirandine ku pêvajoya hikûmtdariya wan, li ser çareşî û qirkirina gelê Kurd diçe pêş. Siyasetek ku bi awayek sîstematîk bikoylekirina Kurdan xwe re kiriye armanc û çi xemekê li çarenivîsa wî xelkî naxwe. Ew bi meşandina wan siyaset û projeyên dagîrkarî, dixwazin bextewerî, hebûn û geşbûna pêşeroja xwe, bi qurbanîkirina gelê me ava bikin.

Dibêjin ku di serdema serhildana xelkê di Fransa bi dijî Qeyser “Louis Auguste de Bourbon” bi sedema nebûna nan, Siltanxanim “Marie Antoinette” dipirse ku “gelo xelk li ber çi serhildanê dikin?”, bersivê werdigre ku “Jiber ku xelkê nan çinine bixwin!” Ew jî dibê ku “ma ew yeka kengê pirsgirêke!? Heke nan nebin ku bixwin, bila “keykan” bixwin!” Ev yeka meseleya me kurdan û desthilatdarên Îranê ye.

Çavnhêr in ku xelk birsî bimîne û di hember zilm û zordariya wan de jî bêdeng be. Ev yeka ne tenê bi wateya birsîkirin û qirkirina xelkê kurd e, lê herwisa bi wateya nebûna azadiyê ye di Îranê bi giştî û Kurdistana dagîrkirî ya ji aliyê Îranê ve ye. Ew gotina me ne li semxatirê dijayetî û antîpatiya me bi siyasetên dagîrkarî yên Îranê ye; Lê li ser bingeha hegerên objektîv e. Nebûna nan di bajarên Kurdan de, bi sedema siyasetên şaş yên rejîmê ye. Jiber ku her wek me di serî de got û statîstîk jî bi zelalî didin eyankirin, Rojhilatê Kurdistanê yekek ji cemserên herî bihêz û berhemanîna genim di Îranê de ye. Eva tê vê wateyê ku bê nan mana xelkê, bi sedema xwezayî nîne; Lê bi hegera ew berbest û astengiyan e ku ji aliyê desthilatdaran ve hatiye afirandin. Yanî ew yeka neazadiyeke nerênî ye ku sedema wê netîceya proje û siyasetên hisabkirî yên rejîm e ku bi mebest tê kirin; Ne eva ye ku gelê me di Rojhilatê de bi sedema xwezayî yan nexweşiyê nekaribe genim û nanê xwe berhem bîne. Yanî mebest lêrede eva ye ku xelk di Rojhilatê Kurdisanê de bi sedema siyasetên rejîmê li hebûna nan hatiye bêparkirin û ev yeka jî nîşana nadadperwerî, nebûna azadiyê û bi kurtî bikoylekirina xelkê û zilma aborî, siyasî û civakî ye derheq gelê me.

Xêncî eva ku me bas kirî, karbidestên rejîmê ji aliyek din ve jî fêlan li xelkê dikin. Gava ku genim li cotyaran dikirin, bi nirxek kêmtir li wê nirxa ku genim li derve tînin, wî genimî li cotyaran distîn. Eva di demekê de ye ku her hikûmetek ji ber ku berhemhênerên wê bikarin li hember berhemhênerên welatên din de rikeberî bike, hem berhemên hundrîn bi nirxek bilindtir dikire û hem jî bi dana sobsîdan, piştgiriya wan dike. Lê mixabin, karbidestên rejîmê ku genim ji cotyaran distîne, perê wan jî di dema xwe de nade wan û li ber hebûna enflasiyonê, nirxa perê wan roj bi roj dadikeve. Ev yeka jî hêza kirîna cotkaran dadixîne û zêdetir destê wan kurt dike.

Pêdivî ye ku cotkarên kurd di pêşerojê de yekgirtîtir û micidtir helwêsta xwe li hember wan hemû neheqî û zilma karbidestên

rejîmê de nîşan bidin û zehmeta xwe jê xwedî derkevin û genim û berhemên xwe yên din bi xwe di nava xelkê de bifroşin û radestê talançiyên Îranî nekin.

Herwisa xelkê me di Rojhilatê de dibe ku li hember wan siyasetên rejîmê bêdeng nemînin û wan neheqiyan bikin fersend bû xweorganîzekirin û dijberiya sîstematîk di hember wan siyasetên dagîrkarî de. Jiber ku heta dagîrkarî bimîne, zilm û zorî jî yê dom bike. Em dibe hemû aliyek bi hev re welatê xwe azad bikin û di bi siya desthilatdariya Kurdî de bibin xwedî keramet û nirxa xwe ya merivî.

Dizî di bin sîbera yasayê de

N: Serbest Urmiye

Axa Kurdan û nemaze Rojhilatê Kurdistanê, axeke bi xêr û bêr e ku ji bilî dahata ser erd, ji aliyê çavkaniyên jêr erdî ve jî bi qasekê dewlemend e ku heke destê diz û talançiyan jê were qutkirin, dikare bijîva jiyana hemû akinciyên xwe û renge zêdetir jî dabîn bike. Di demekê de ku barê akinciyên vê axê her li ser milê wan e û sîngê wan her roj malovanê gulleyên dagîrkerê axa wan e, di bin siya yasayên dewleta dagîrker de, bi eşkere û nepenî heyîn û sermayenên ser erd û jêr erd ên Kurdistanê tên talankirin. Bi awayekê ku hin caran heya bi nav nûner û peyayên rejîmê jî li ser vê rewşê hatine deng û nekarîne veşêrin. Ji bilî talankirin û şewitandina bi eşkere ya daristan û lewitandina xweza û jîngeha welatê Kurdan, çavkaniyên jêr erd yên Kurdistanê jî hertim hatine û tên talankirin.

Li gor hin çavkaniyên rejîma Îranê, tenê li parêzgeha Sine ya Rojhilatê Kuristane de, ji bilî kanza (meiden)ên hesin, zêr û zîv, nêzîk 400 kanzayên din yên berkar hene ku li gor gotina "Seyîd Ehsen Elevî", nûnerê gerrên nehemîn û dehemîn yê bajarên Sine, Kamiyaran û Dîwandere di meclîsa rejîmê de, 16 heya 17 ji sedî ji aboriya Îranê pêktînin. Aboriyek ku netenê qazancê wê ji xelkê Kurdistanê re çinine, belkû yê bûye sedema hin pirsgirêkên din jî bo xelkê herêmê. weke mînak, rê û cadeyên Kurdistanê ji ber tirombelên barhilgir yên talançiyên giredayê bi rejîmê ve, yê bûne qetilgeha xelkê herêmê û her sal Kurdistan xwediyê hejmareke bilind e ji goriyên bûyerên hatin û cûnê.

Ji aliyeke din ve û li gor gotina wî nûnerê rejîmê û hin kesên din, aliyê kêm di salê de ji wan 400 kanzayên parezgeha Sine, 600 heya 700 milyon ton maddeyên "meidenî" yên xav tên rakirin ku dikare 4000 derfetên karkirinê bo xelkê Kurdistanê biafirîne. Lê eva di demekê de ye ku rêjeya bêkariyê tenê di parêzgeha Sine de jordeyî 40 ji sedî ye. Karnasên aborî û yên pispor di warê "seniet û meiden" de, pirsgireka herî mezin veguhastina berhema xav ya kaznayên Kurdistanê bo derveyê Kurdistan û Îranê didin zanîn.

Rejîma Îranê ji bo ku xweza û semana xelkê Kurd talan bike, heya niha jî amade nîne ku teknolojiya kêranîna maddeyên xav di Kurdistanê de damezirîne, belkû hemû berhema xav ya kanzayên Kurdistanê bi hêcetên ewlehî û siyasî û aborî dibe derveyê heremê. Vê yekê jî derfeteke mezin ya diziyê daye destê karbidestên rejîma Îranê, nemaze karbidesten Spaha Pasdaran ku di rêya yasayî de û li gor yasaya ku bi xwe xemilandine, sermaya Kurdistanê ji reyên cur bi cur ve derbasî derveyê Îranê bikin. Ev rêya talankirina yasayî bi qasekê derbe li aboriya Kurdistanê daye û hin caran êdî heya nûnerên rejîmê jî jê bêdeng nebûne. Herçend ku di talankirina saman û çavkaniyên ser erd yên Kurdistanê de, hatiye dîtin nûnerên rejîmê yên Kurd jî bêpar nebûne.

Nûnerê bajarê Bîcarê yê meclîsa rejîmê, çend salan berî niha dabû eşkerekirin ku rejîm bi belgeyên destçekirî yên Wezaretên Veguhastin û Bazerganiyê, berhemên kanzayên Kurdistanê, bi dizî û ji rêya berava (gemîgeha) "Îmam Xumeynî" ve derbasî derveyê Îranê dike. Nûnerê han



herwiha vê jî dide eşkerekirin ku ji bilî talankirina maddeyên meidenî yên Kurdistanê di bin sîbera yasayê de, heqdestê ajotkarên tirombêlên ku vê diziyê jî dikin bi awayekî dûr ji yasaya veguhastinê, jorde birine ku ev zêdebîna heqdestê ajotkaran jî bi xwe sedemeke din e ji bo ku derfeta karkirinê ji xelkê heremê were standin û sîstema veguhastinê jî di Kurdistanê de were asteng kirin.

Nerîna Lîderan

“Mike Pompeo”:
“Terorîstên ser bi Îranê baregeha sereke ya PDKê ya li Bexdayê şewitand”.

“Feysel Bin Ferhan”:

“Kîdera wê cîhanê arîşeyek hebe, destê rejîma Îranê têde ye”.

“Morgan Ortegas”:

“Îranê terorîstek wekî balyoz şandiye Yemenê”.

“David Friedman”:

“Hekî Trump bibe Serkomar dê Rojhilata Navîn bo 100 salên dinê biguhere”.

Mesûd Barzanî: Spaha Pasdaran û Heşda Şeibî bi çekên Amerîkî êrîşî ser Kerkûkê kirin

N: Eskender Ceiferî

Çend rojan beriya niha salvegera referandoma serxwebûna Kurdistana Başûr bû. Mesûd Barzanî serkirdeyê Kurdistana Başûr wê referandûmê, hevdem ligel salvegera dastana Pirdê binav dike û dibêje: “Îro weke duh nîn e, sibe jî wek îro nabe.”

Roja Duşemê 20.10.2020an Mesûd Barzanî li ser hejmara xwe ya taybet a Twitterê ew peyam belav kir.

Piştî ku 16ê Cotmeha 2017an û Kerkûk û beşek ji navçeyên Kurdistanî yên derveyî îdareya Herêma Kurdistanê hatin dagîrkirin, Heşda Şeibî û hêzên Iraqî û Sipaha Pasdaran roja 17ê Comehê bi tank û zirîpoşan dest bi êrîşa ser Hewlêrê kirin, lê hêzên Pêşmerge li li devera Pirdê rûbirûyî wan bû û ew êrîşî şikandin. Mesûd Barzanî jî vê carê bi peyama xwe, ev êrîş piştrast kiriye û ragihandiye ku Sipaha Pasdaran li pişta êrîşê bû.

Wê demê, piştî rêveçûna referandûmê, Mihmmed Pakpûr fermandarê Hêzên Pasevan ên Îranê ragihandibû ku Îran û Iraqê ji bo ewlekariya sînoran manorek encam dane û wê hevrêziya wan zêdetir bibe û armanc jê, parastina sînorên bi Iraqê re ye. Ji bo vê armamcê, Îranê gelek tank şandibûn sînorê Herêma Kurdistanê. Berî ku ew hêz derbasî wir bibin, Mesûd Cezayirî cîgirê sererkanê Îranê ragihandibû ku wan veguhestina petrola Herêma Kurdistanê sekinandiye û wê bi Bexdayê re zêdetir hevrêziyê bikin.

Ji hêla din ve, Mihemedcewad Zerîf wezîrê Karên Dervê yê Îranê daxuyanî dabû û gotibû ku em di wê baweriyê de ne ku serxwebûna Kurdan şaştiyeke cidî ye. Ew, her ji destpêkê ve ji serxwebûna Kurdan bi tirs bûn û Xamineyî ragihandibû ku ew nahêlin Îsraîla duyem bê avakirin.
Elî Xamaneyî rêberê Komara Îslamî di hevdîtina Receb Teyyîb Erdogan serokkomarê Tirkiyê de, gotibû ku referandûma serxwebûnê ya Herêma Kurdistanê ku roja 25ê Îlona 2017an hat encamdan di berjewendiyên Amerîka û Îsraîlê de ye ji ber ku li gor îdiaya wî, li navçeyê bawerî bi Amerîka û zilhêzan nemaye, lewra ew li pey avakirina îsraîleke nû ne. Got jî encamdana referandûmê, derheqê herêmê xiyanet e û dibe sedema gefê ji bo pêşeroja herêmê. Ji ber vê, divê Îran û Tirkiye li hemberî vê bûyerê gavên pêwîst bavêjin. Hikûmeta Iraqê jî divê bi awayekî cidî biryarê bistîne.

Ew ji wê demê ve ketin fikra guhertina sîstema Îraqê yan jî têkdana fêdêraliyê û vegerandina Îraqê bo serdema qirkirina Kurdan. Wê demê ne aliyê Îranî û ne jî Tirkiyê neveşartibûn ku naxwaze Sûriye, Iraq, Îran û Tirkiye perçe bibin.

Lê belê tevî hemû hewlên dagirkaran, dengê Komara Îslamî û rejîmên din ên dagirkarên Kurdistanê di mijara dewleta Kurdan de serneket û Referandûma serxwebûna Kurdistanê hate encamdan. Bi serkeftina dengên erê, dengê Îranê ji bo dijatiya referandûmê bêbandor ma. Lê vê carê Komara Îslamî xwast bi têkderiya xwe li navçeyê pêşiya ragihandina serxwebûnê bigire.

Rûsye, Îran û Tirkiyê referandûm gotûbêj kirin. Wan nîşan dabûn ku rêgirîkirin ji serxwebûna Kurdistanê, ji bo wan çiqasî girîng e lê belê gefa herî mezin Îran bû û Îranê ew han didan ji bo ku dijatiya serxwebûna Kurdan bikin.

Wê demê, Ryan Crocker balyozê berê yê Amerîkayê li Bexdayê dabû xuyakirin, ji bo Kurdistanê gefa herî mezin ne Tirkiye ye, lê belê Îran e. Rast e Tirkiye jî piştî referandûmê, gef li rêveberiya Kurdistanê xwaribûn, lê roleke xuya û berbiçav a Tirkiyê di vê mijarê de tine bû belkî pirsgirêka sereke ji bo Kurdistanê Îran bû. Wan dixwast Kurd ji encamê vekişin. Wî herwisa rêveberiya Amerîkayê ji ber helwesta wan rexne kir û got ku vê helwestê hiştiye Bexda wêrekiyê li hemberî rêveberiya Herêma Kurdistanê bi dest bixîne û tevî ku Kurdan referandûmeke aştiyane pêk aniye, lê gefan li Kurdan dixwen.

Rejîma Komara Îslamî hemû hewlên xwe bi kar anîn ji bo dewletên misilman rê nedin dewleta Kurdî were avakirin. Elî Ekber Velayetî fermandarê Îranî ragihand ku ewê ligel Enqere û Bexdayê li hemberî ragihandina dewleta Kurdî derkevin û roja piştî referandûmê jî, pergala parastina moşekan li ser sînorên Kurdistana Rojhilat ku bi Herêma Kurdistanê re hevsînor e, bicih kirin. Wan wê demê ragihandibû ku armanc ji bicihkirina wan moşekan, lihemberderketina êrîşên dagirkeriyê hatiye ragihandin. Lê di rastî de tirsa wan a sereke, serxwebûna Kurdan bû.

Belkî tirsa herî mezin a Îranê, ne serxwebûna Başûr be lê belê Îran ji perçebûna xwe bitirse. Muhamed Cewad Zarîf wezîrê Derve yê Îranê gotibû ku serxwebûn tenê bi herêma Iraqê re sînordar namîne û ji ber ji ber wê, Îran û Tirkiye lidij derdikevin da ku bandora referandûma serxwebûnê li ser welatiyên wan yên Kurd tine be.

Piştî pêkanîna referandûma serxwebûnê li Herêma Kurdistanê, xelkê li bajarên Kurdistana Rojhilat jî bi coşeke mezin pêşwaziya wê kirin û ji bo pîrozkirina encamdana referandûmê bi alayên Kurdistanê derketin kolanan.

Niha piştî çend salan, ev ji bo cara yekemîn e ku Mesûd Barzanî serkirdeyê Kurdistana Başûr, behsa êrîşa rasterast a Sipaha Pasdaran dike ku ev jî nîşan dide, êdî Kurd ji berê zêdetir pê agehdar in ku pirsgirêka sereke ji bo wan li navçeyê, tenê rejîma Tehranê ye.

Rêkkeftina Şingalê û kartêkirina wê li ser Rojavayê Kurdistanê

N: Ebdulazîz Qasim

Rêkkeftina ji bo asayîkirina rewşa Şingalê ya ku di 10.10.2020`an de, bi çavdêriya NY di navbera Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Îraqê de hatiye îmzekirin, ku ji aliyê hin hêzên Erebî ve bi taybetî yên alîgirên rejîma Îranê wekî şikestin hate nirxandin, berevajî ji aliyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve wekî destkeftek hate nirxandin, nemaze ku xalên Rêkkeftinê yên ji bo vegera ewlehî û aramiyê û asayîlkirina rewşa Şingalê û vegera koçberan û avadankirina vê devera girîng dikevin di qazinca Kurdên Êzîd de û dikevin di qazinca avadankirina vê devera girîng de ku girîngiyek taybet ji aliyê netewî û olî û cugrafî heye.

Ev Rêkkeftin, guhdariya Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi çareserkirina êş û azarên xelkê Şingalê dupat dike û bi vê yekê baweriyên Êzîdiyan bi piştgiriya Hikûmeta Kurdistanê ve bihêz dike û herwiha ji aliyekê din ve hejmongeriya Îranê ya bi rêya "Hişda Şe'bî" lawaz dike û hem jî rêdigire li pêşiya destêwerdana Tirkiyê bi hênceta hebûna PKK'ê.

Ji aliyek din ku ev Rêkkeftin wê bibe sedem ji bo avadankirin û geşepêdana devera Şingalê û dibe bibe nemûne ji bo dubarekirina Rêkkeftinên din bi heman şêweyî li hin deverên din yên veqteyayî ji herêma Kurdistanê û derbarê vê yekê axaftina serokwezîrê Herêmê rêzdar Mesrûr Barzanî: "Rêkkeftin destpêkeke ji bo bicihkirina birga 140 ya destûrî ye", balê dikişîne li ser asayîkirina rewşa Kerkûkê jî, ji ber ku rewşa Kerkûkê jî bi heman yasa 140 ve girêdayî ye, û ji ber vê yekê ji aliyê alîgirên Hişda Şe'bî ve bi awayekî hovane êrîş li ser navenda PDK li Bexda hat ogranizkirin û têde navend û Alaya Kurdistan hatin şewtandin.

Helbet ku asayîkirina rewşa devera Şingalê daxwazek Amerîkî ye, lê ev yek ji bo Herêma Kurdistanê girîngiya xwe heye, belkî heman girîngî û zêdetir jî ji bo Kurdên rojava heye, ji ber ku Şingal dikeve li ser sînorê Kurdistana Sûriyê û bi taybetî dikeve li ser sînorên kilîngehên neftê yên "Rimêlan-Siwêdiyê" heta bigihêje kilîngehên gaz û nefta "Cibisê" li başûr û rojhilatê bajarê Hisiçe "Heseke", lewra heta radeyekî dikarin bêjin ku aramiya Şingalê ji aramiya Hesekê ye, û Hesekê pêgeha xwe ya stratîjî heye hem ji aliyê Amerîka ve, û hem ji aliyê Kurdan ve, ji ber vê yekê ku asayîkirina rewşa vê deverê, yekser wê bikeve di qazinca Kurdên Rojava de û wê kartêkirinek erênî bike li ser rewşa Rojavayê Kurdistanê û Rojhilatê Firatê û herwiha bi giştî li ser rewşa Sûriyê jî, nemaze di warên siyasî, aborî û ewlekarî de.

Jiber ku wekî herkes dizane ku demeke danûstandin li Rojavayê Kurdistanê bi çavdêriya Amerîka û Fransa dibin ji bo asayîkirina rewşa Rojhilatê Firatê, ku di nav de beşek ji Kurdistana Sûriyê heye, û heta radeyekî ku ev rêkkeftina Şingalê ya niha di heman çarçoveyî de tê dîtin, lewra wê asyîkirina rewşa Şingalê bibe fakter ji bo aramiyê li hemû deverê peyda bike, hewldanên bi vî awayî helbet wê bibin handir ji bo serkeftina danûstandinên di navbera ENKS û PYNK de ji ber girêdana heman danûstandinan bi pirsên têkildar ve nemaze aloziyên taybet bi gefên Tirkiyê yên bi hênceta hebûna PKK li Şingal û Rojavayê Kurdistanê.



Li gor xalên rêkkeftina Şingalê, ku wê metirsiya grûpên çekdar yên Îranê li ser Şingalê lawaz bike, ku metirsiya van grûpan her li ser Sûriyayê bi giştî heye, ji ber vê yekê heta radeyekî ku wê metirsiya grûpên Îranê li ser berjewendiyên Amerîka li Sûriyê kêm bike û Rojavayê Kurdistanê jî wê ji gefa destêwerdan û dagîrkeriya Tirkiyê biparêze, ji ber wiha dikarin bi gelek wateyan bêjin ku ev rêkkeftin destkeftek mezin e, ku çarenivîsa Êzîdayetiyê bi Kurdayetiyê ve girê dide û Şingalê û deverên mayî ji Kurdistana Sûriyê diparêz e.

Nirxa kincên zivistanê di Urmiyê de giran bûye

Hevdem digel hatina demsala sirê û daxwazkariyên xelkê bo kirîna kinçan, nirxa kincên zivistanê gelek giran bûye û piraniya xelkê şiyana kirîna wan nîne.

Xelk bi sedema enflasyon û giraniyê di bin givaşek zêde de ne û nirxa kincên zivistanê li çav salên derbasbûyî gelek bilind bûye.

Piranya xelkê bi sedema bilindbûna nirxê kincan neçar in di tanakorayê de kincan bikirin.

Nirxa palto û kapşên berhema hundirî ji 300 hezar tumen heta 500 hezar tumen e.

Hevdem nirxa kincên biyanî 850 hezar tumen heta 5 milyon tumen e.

“Dawûd Pûrelî” Serokê Berhemhênera Kincan di Urmiye de gotiye nirxa parçe %70 bilind bûye.

Keçeke Xwendekare ya Îlamê di bajarê Tehranê de hate binçavkirin

Çend roj beriya niha hêzên ewlehî keçeke xwendekar a Kurd ya bi navê “Sumeye Karger” a xelkê Îlamê û rûniştiyê bajarê Tehranê binçav kirin û bo cihek nediyar veguhastin.

Hêzên ewlehî piştî êrîşkirin bo ser mala wê keça xwendekar, dest bi vekolîna mala wê kirine û hindek tiştên wê yên şexsî digel xwe birine.

Piştî lipeyketina malbata wê keça xwendekar bo agehdarbûn ji çarenivîsa keça xwe, dadseraya girtîgeha Êvînê bi malbata wê re ragehandiye, ku keça wan bi tohmeta “cezaya înternêtî” hatiye binçavkirin.

“Sumeye Karger” nesaxiya çav heye û di dema bincavkirinê de li hemû dermanekê hatiye bêparkirin û eva jî bûye sebema nigeraniya malbata wê.

Nûçegihaniya “Hêrana” di vê derheqê de gotiye, ku “Sumeye Karger” derçûyê beşa Felsefê di Zanîngeha Tewrêzê de bûye û heta

niha li sedema binçavkirin û cihê ragirtina wê û heta navenda biçavkirina wê keça xwendekar ti zaniyaryek ji ber dest nîne.

Birîndarbûna kasibkarekî Merîwanî di Kirmaşanê de

Roja Pêncşemî 24ê Rezberê, kasibkarek yê xelkê Merîwanê yê bi navê “Îsmaîl Newrozî”, temen 36 salî û rûniştiyê şehreka “Kanîdînar” ya wî bajarî bi teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê di Kirmanşanê de hate birîndarkirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, hêzên leşkerî yên hikûmetê bi heceta hebûna tiştên qaçax, teqe ji maşîna wî kasibkarê Kurd kirine û bi dijwarî navbirî birîndar kirine.

Herwisa wê çavkaniyê gotiye: “Ew kasibkare di encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê de, çend gulle berketine û niha di nexwşxaneya “Taliqanî” a Kirmanşanê de di bin çavdêriya pizîşkî de ye.

Hatiye gotin ku ew kasibkare heta niha sê caran niştergerî bo hatiye kirin.

Jiyannameya Seydayê Cegerxwîn

Navê Cegerxwîn di esla xwe de Şêxmûs e û kurê Hesen yê Mihemed e û navê dayîka wî jî Eyşan e. Cigerxwîn bi xwe jî nizane ka di kîjan salê de hatiye dinê, lê sala jidayikbûna xwe di navbera salên 1900-1903 an dide diyarîkirin. Ew li gundê Hesarê yê girêdayî bajarê Nisêbînê li Bakurê Kurdistanê di nava malbateke hejar û Kurdperwer de hatiye dinê.

Piştre ew ji ber helwesta xwe ya Kurdayetiyê koçberî Rojavayê Kurdistanê bûne û li bajarê Amûdê bi cîh bûne. Bavê Cegerxwîn li sala 1918an li Amûdê wefat kiriye û diya wî jî salekê piştre di 1919an de li gundê Bêdirmemo çûye ser dilovaniya Xwedê. Wefata dayîk û bavê wî jiyana wan ya asayî dijvar kir. Şêxmûs an jî Cigerxwîn ji ber belengazî û hejariyê neçar maye ku ji temenê zarokatiyê de karên rênjberî û paletî yê, bike da ku bikare jiyana xwe bi rê ve bibe. Demekê jî bûye feqiyê ber destê meleyan. Di wan serdemê jiyana xwe de bû ku wî belengazî û bêbextiya bi dijî gelê xwe dibîne û sedemên bindestiya Kurdan baştir nas dike û dikeve pey rêyekê ku dermanekî ji wan êşên giran re peyda bike.

Dilêşiya Cegerxwîn ya ji bo qedera gelê wî ji kûrahiya dil û canê wî dihat. Pênaseya herî rast û durist ji bo kesayetiya siyasî-civakî ya Cegerxwîn helbestên wî yên hemasî ne ku ji keç û xurtên Kurdistanê û Kurdayetiya pîroz re bûne manifestoyek tim zîndî. Cegerxwîn di jiyana feqîtî û melatiyê de li her çar perçên Kurdistanê geriyaye. Armanca wî ji karekî wiha bû ku bêtir derdên bindestiya gelê xwe nas bike û di hişyarkirina wan de rolekî bilîze.

Du bûyerên mezin di herêmê de çêbûn, û ev bûyer bûne sedema guhertinê di kesîtiya Cegerxwîn de, bera wî bi xurtî ber bi niştimanperweriyê ve dan û ev jî ev in:
1-Şerê cîhanî yê yekem ku



bû sedema serxwebûna gelên bin dest û peymana taybet bo Kurdistanê ku bi navê “Sêver” tê nasîn û fêlên Turkan li dijî wê peymanê.
2-Jinavçûna şoreşa Şêx Seîd di sala 1925an de ku Tirkan gelê Kurd û şervanê şoreşê û ev rêber bi nemirovane kuştin. Bi sedan ji wan şoreşgêran gihiştin Sûriyê. Wan şoreşgêran di sala 1927an de komeleyek bi navê “Xoybûn” ava kirin. Cegerxwîn tevlî vê komeleyê bû û bû yek ji endamên wê.

Cegerxwîn hêşta ciwan bû ku di sala 1927an de bi keça xalê xwe “Kehla Mistefa” re zevicî û ew bûn xwediyê 5 keç û 2 kuran. Kurên wî Keyo û Azad û keçên wî jî Sînem, Gulperî, Rojîn, Benîye û Selam in.

Cegerxwîn li Kurdistanê ji bo jiyana xwe çîrokekê dûr û dirêj li pey xwe bi cih hêlaye. Lê xebatên wî yên siyasî di avakirina komele û civatên Kurdî de gelek balkêş in. Cegerxwîn di sala 1946an de digel Dr. Ehmed Nafiz, Arif Ebbas, Evdilrehman Axa, Mela Elî, Muftî Mela Ehmed û Hacî Yûsif, “Civata Azadî û Yekîtiya Kurd” ava kirin. Cegerxwîn di bîranînên xwe de li ser vê civatê wiha dibêje: “Vê civata me çend tiştên hêja kirin”:

1-Civatê çil perçe daxwazname şandin Sanfiransîsko.

2- Me Çend caran peyam û nivîsên xwe ji bo Komara Kurdistanê di Mihabadê de şandin.

3-Civatê gelek caran bi Ingilîz û Amerîkayiyan re danûstandin kiriye. Lê her du dewletan jî digotin: “Hûn hevalbendên Komara Kurdistanê û hevalbendên Soviyetê ne”.

Cegerxwîn di hemû nivîsên xwe de ji ber ku mezinên Kurdan derfetên mezin ji dest dane û nekarîne bi yekîtiyekê dewleteke xwe ya netewî û serbixwe pêk bînin, pir xembar e. Ew çawaniya pêkhatina şoreş û serhildanên lîderên mîna Simkoyê Şikak, Şêx Mehmûdê Berzencî, Şêx Seîdê Pîran, Şêx Ebdulselam Barzanî, General Îhsan Nûrîpaşa, Mele Mistefa Barzanî, Seyîd Riza Dêrsimî û çawa pêkhatina Komara Kurdistanê ya di bin serokatiya Pêşewa Qazî Mihemed de dinivîse û li ser sedemên têkçûna wan serhildanan jî dîtinên xwe bi awayekî xweş tîne ziman.

Cegerxwîn di rêketa 03- 08ê 1979an de bi hevkariya hinek Kurdên ku li Sûêdê dijiyan çû Ewropayê û di demeke kin de dest bi weşandina berhemên xwe kir ku ji ber qedexebûnê nedikarî li Kurdistanê wan biweşîne. Êdî wî dikarî tenê di etmosfêrekî azadtir de henasê bikişîne, lê hewayê axa Kurdistanê çi caran ji bîra wî nediçû. Wî hertimî bîra welatê xwe dikir û bêhna welatê xwe his dikir. Cegerxwîn di Ewropayê jî xebata xwe berdewam dikir û agehdarê bûyerên ku di welatê wî ya parçe parçebûyî de diqewimîn dibû û helwestên tund li hember dagîrkeran digirt. Wê demê li dijî fitwaya cîhadî ya xumêynî ku li dijî Kurdan da bertek nîşan da û bi tundî şermezar kir.
Dema ku li sala 1979an gelên Îranê şoreşek seranserî li dijî Mihemed Riza şahê Pehlewî lidar xistin, pareke mezin a Kurdistanê jî ket destê Kurdên Rojhilatê Kurdistanê. Lê rijîma paremayî ya Îslamî li dijî Kurdên azadîxwaz şerekî giran da destpêkirin ku heta sala 1984´an bi giranî berdewam bû. Wê demê mamosta Cegerxwîn li Ewropayê bû û bi rêya rojname, radiyo û TVyên Sûêdî ve behsa cinayet û xwînmêjiya rijîma Xumêynî dikir. Wî li dijî fitwaya cîhadî ya Xumêynî ku di 19ê Tebaxa 1979´an de li dijî hemû Kurdên şoreşger li Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê wî ve hatibû îlankirin, helwesteke tund da xuyakirin û di hemû hevpeyvînên xwe de rûreşiya vê rijîma kevneparêz bêtir ji raya giştî ya Ewropa re da eşkerekirin.
Cegerxwîn di nava Kurdan de bêtir bi helbestvaniya xwe tê naskirin û hezkirin, lê berhemên wî yên din jî hene ku di pirtûkxaneya Kurdan de cihekî berçav digirin.
Di parek ji helbestên mamosta Cegerxwîn de bêtir ji her tiştî felsefeya serhildan û şoreşgeriyê li dijî dagirkerên talankar tê dîtin. Ew bi rêya helbestên xwe ve bandorek erênî li ser rewşenbîriya gel dilîze.

Cegerxwîn di helbestekê de (Kîme Ez) dîroka tejî serfirazîya gelê xwe bi bîra herkesî tîne û daxwazê ji gelê xwe dike ku ji bo rizgarkirina nîştimana xwe heta can û malê xwe jî fîda bikin.
Bi bihîstina helbestên Cegerxwîn mirov ji dil dixwaze ku di nava dil û mejiyê xwe de şoreşeke hemûalî pêkbîne. “Kurdistan” gotina wî ya yekê û dawiyê ye. Kesê ku bi hemû hiss û heza xwe axa Kurdistanê neperêze li cem mamosta Cegerxwîn mirov nayê hesibandin. Ji ber wê jî Cegerxwîn di hemû berhem û gotarên xwe de dilşewatê bindestiya welat û gelê xwe ye.

Cegerxwînê helbestvan, nivîskar û rewşenbîrê Kurd di roja 22-10ê 1984an li xerîbiyê û dûr ji axa bav û kalê xwe li welatê Sûêdê çû ser dilovaniya Xwedê. Ev xebera nexweş di nava raya giştî ya Kurdan de zû belav bû. Lê dema termê wî vegerandin bajarê Qamişloyê bi hezaran kesan di merasima veşartina termê wî de beşdarî kirin. Keç û xortên Kurdistanê ji ber wefata wî hêsir barandin, ew bi bîranîn û bi xemgînîyek mezin termê wî di hewşa mala wî ya li bajarê Qamişlo bi axa pîroz a Kurdistanê sipartin.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Adil Mukerem di hember piştguhxistina daxwazkariyên xwe de agir berda cesteyê xwe

Roja Yekşemî 27ê Rezberê, “Adil Mukerem” girtiyê siyasî yê Kurd di girtîgeha Urmiyê de li derheq cîbicînekirina daxazkariyên wî nerizayetî nîşan da û agir berda cesteyê xwe.

Çavkaniyek agehdar di wê derheqê de bi ajansa “Kurdpa” reyê ragehandiye: “Ew girtiyê Kurd di salona girtîgeha Urmiyê de di pêş çavên dadwerê çavdêrî û cihgirê girtîgehê agir berda xwe.

Wê çavkanya agehdar ya “Kurdpa”yê gotiye: “Lingê wî yê rastê bi sedema agir bi dijwarî birîndar bûye û navbirî di bêhdariya girtîgehê de di bin çavdêriyê de ye .

Roja sêşemî 22ê Rezberê, “Adil Mukerem” girtiyê siyasî di girtîgeha Urmiyê de piştî cîbicînekirina daxazkaryên wî ji aliyê berpirsên girtîgehê ve, car din dest avêtibû bi girevgirtinê.

Roja Çarşemî 16ê Rezberê, ew girtiyê siyasî li ser sozên berpirsên girtîgehê bo pêragehiştin bi dosiyaya wî, dawî bi gireva xwe anî .

Dadwerê çavdêr yê girtîgehê, berpirsê girtîgehê, navenda ewlehî û karnasê dosiyaya wî soza pêragehiştin bi dosiyaya “Adil Mukerem” dabûn.

“Adil Mukerem”, di dema bi bawî anîn bi gireva xwe ragohanibû, ku bi egera cîbicînekirina daxwazkariyên wî, dê car din dest bi girevgirtinê bike.

Roja Yekşemî 13ê Rezberê, ew girtiyê siyasî bi nîşana nerizayetî li derheq nediyarbûna çarenivîsa wî di girtîgehê de, bi dûrîna lêvên xwe dest avêt bi girevgirtinê. Herwisa piştî gireva xwe bo odeya takekesî hatibû veguhastin.

Biryar bû ew welatiye roja Pêncşemî 13ê Xermananê, piştî 10 mehan ji nerohniya çarenivîsa wî di taya 2 a dadgeha Înqilabê de bi serokayetiya “Şêxlû” bê dadgehîkirin, lê dadgeha wî hate hilûşandin û kombûna dadgeha wî di rêkevta 22ê Xermananê de bi rê ve çû.

Tohmeta ku bi ser wî girtiyê siyasî de hatî sepandin, “Endambûn di yek ji Partiyên Kurd yên opozîsyona hikûmeta Îranê û derbasbûna neyasayî ji sînor” pêre hatiye ragehandin.

“Adil Mukerem” Sermaweza sala 1398an, piştî dîportkirina wî di welatê Tirkiyê de ji aliyê hêzên ewlehî ve radestî Îranê hate kirin.

Ew welatî bo heyama 19 rojan di girtîgeha îdareya Îtilaata bajarê “Xoy”ê de rastê lêpêçînê hat û piştre bi dawîhatina heyama lêpêçîna wî bo girtîgeha wî bajarî hate veguhastin.

Piştre navbirî bo girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê hate veguhastin û di benda girtiyên siyasî ya wê girtîgehê de ye.

Kolberekî Kurd bi teqeya hêzên leşkerî li ser sînorê Çaldiranê canê xwe ji dest da

Êvara roja Semî 26ê Rezberê, kolberekî Kurd yê bi navê “Emîn Şems” bi teqeya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê li ser sînorê Çaldiranê hate kuştin.

Hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê bi bê agehdarkirina berê teqe ji wî kolberê kurd û çend kolberên din kirine.

Ew kolberê Kurd xêzandar e û bavê zarokekê ye.

Kolberekî xelkê Banê ji aliyê hêzên leşkerî yên rejîmê ve rastî azar û îşkencê hat

Şeva Duşemî 28ê Rezberê, hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê “Brwêşkan” a bajarê Baneyê, Kolberekî Kurd yê bi navê “Yasîn Fîkrî”, temen 22 salî azar û îşkence dane.

Çavkaniyeke agehdar di vê derheqê ragehandiye: “Ew Kolberê Kurd ku li ser sînorê “Brwêşkan” ji aliyê hêzên leşkerî ve rastî azar û îşkencê hatibû û ti kelûpelek qaçax bi wî re nebûye”.

Wê çavkaniyê gotiye: “Fermandê “Henga sînorî” ê “Brwêşkan”ê digel du serbazên din demjmêr 9 şevê heta 5 sibê ew kolberê Kurd azar û îşkence dane.

Di berdewamiyê de gotiye: “Hêzên leşkerî yên hikûmetê sê gopal û du dar li ser wî kolberî Kurd de şikandine û hemû cesteyê wî reş û şîn kirine, cuda li lêdan û birîndarkirina wî kolberî temen 22 salî, fermandê binkeya Brwêşkanê fîlma lêdana wî kolberê Kurd girtiye”.

Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (384)

Başûrê Çemê Eresê bû armanca 71 mûşekan

Cihgirê Siyasî-Ewlehî yê Parêzgeha Tewrêîzê ragihandiye, ku di şerê Qerebaxê de 71 rakêt di başûrê çemê Eresê de ketine.

Wî berpirsê rejîmê daye zanîn ku ti zirareke malî û canî tinebûye.

Ji destpêka şerê Qerebaxê, gelemper 69 gulle bi axa Îranê ketine, lê bi tenê li roja Çarşemiyê de 71 rakêt di nav axa Îranê de ketine.

Ew 71 rakêt li tenişt gundê "Xuda Aferîn" di parêzgeha Tewrêzê de ketine.

Li ser wê mijarê, Artêşa rejîma Îranê serdana wî gundî kiriye û bi herdu aliyên şer re hişdarî daye.

Berê belavoka "Foreign policy" belav kiribû ku şerê di navbera Ermenistan û Azerbaycanê de dê rewşeke aloz bo rejîma Îranê biafirîne.

Wê belavokê dabû xuya ku di Îranê de nêzî 20 milyon Azerî ziman hene ku metirsiyeke micid li ser ewlehiya rejîma Îranê ye, rejîma Îranê jî naxwaze di wî şerî de tûşî şikestê bibe, lê destekî lawaz heye.

"David Friedman": "Hekî Trump bibe Serkomar dê Rojhilata Navîn bo 100 salên dinê biguhere"

Balyozê Amerîka li Îsraîlê, "David Friedman" daye zanîn ku hekî "Donald Trump" di hilbijartina Serkomariyê de careke din piraniya dengan bi dest xwe ve bînê dê Rojhilata Navîn bo 100 salên din biguherîne.

Roja Çarşemî, 21ê Çirriya Pêşîn, Balyozê Amerîka li Îsraîlê, "David D. Friedman" ragihand: "Hekî em bikarin heta 4 salên din li desthilatê de bimînin, welatên ku tenya rêkara wan eva ye ku em li desthilatê de nebin ti çareyek bilî rêkevtineke erênî digel me nînin û em hivîdar in ku bikarin Rojhilata Navin bo 100 salên bê biguherînin û dawî bi hemû çalakiyên metirsîdar, wêranker û dijî mirov di deverê de bînin ku ew hemû bêhêvitî bo xelkê Rojhilata Navîn li pey xwe aniye".

Herwisa "David Friedman" got: " Rêkara Îranê eva ku her roj 5 caran dûayan dikin ku "Donald Trump" serketiyê wê hilbijartinê nebe, û dizanin hekî "Donald Trump" careke din bibe Serkomar rejîma Îranê ti rêyek bilî bidawîanîna çalakiyên xwe yên wêranker bona derketin ji givaşan tinînin ku Amerîka ew rastî wan dorpêçan aniye.

Pêka karnasên pêwendiyên navnetewî, siyaset û stratejiya Amerîka di hember rejîma Îranê de negor e û her Partiyek di Amerîkayê de bibe desthiltdar pêka wê stratejiyê dê siyasetê bike.

Sûdan asayîkirina pêwendiyên xwe digel Îsraîlê dê wajo bike

Piştî asayîbûna pêwendiyên Îmarat û Behrên digel Îsraîl, Sûdan jî dixwaze asayîkirina pêwendiyên xwe digel Îsraîlê wajo bike û pêka gotinên berpirsên Amerîka, dê Sûdan ji listê reş yê welatên piştevanê terorîzmê bê derxistin.

Roja Çarşemî, 21ê Çirriya Pêşîn, rojnameya Îsarîlî ya bi navê "Israel Hayom" ku nêzî Serokwezîrê Îsraîl, "Benjamin Netanyahu" ye, daye zanîn ku piştî welatên "Îmarat û Behrên"ê dewleta Sûdan jî dixwaze pêwendiyên xwe digel Îsraîlê asayî bike û wê biryara xwe wajoya bike û herwisa daye zanîn ku danûsitandinên Amerîka û Sûdanê pêngaveke dîrokî ye û ragihandiye ku Amerîka ku beşek ji wê biryardanê ye, dê navê Sûdanê ji lîsteyê reş yên welatên piştevanê terorîzmê derxîne.

Li ser wê mijarê, berê "Mike Pompeo" ragihandibû ku piştî qerebûya 335 milyon dolarî ji aliyê Sûdanê ve bi qurbaniyên terorîzm di Amerîkayê de, karûbarên derxistina navê Sûdan ji listê reş yê welatên piştevanê terorîzmê dest pêkiriye.

Piştî ku navê Sûdan ji lîsteyê welatên piştewanê terorîzmê bê derxistinê, ew welat dê ji alîkariyên Amerîkayê mifah vergibre.

Rejîma Îranê bi caran gef ji wan welatên Misilman xwarine ku pêwendiyên xwe digel Îsarîlê asayî dikin.

Piştî fitne û alozîxistinê rejîma Îranê dijî Îsraîl û ewlehî û asayîşa cîhanê, piraniya welatên Ereb û Misilman li Rojhilata Navîn hewl dane ku

pêwendiyên xwe digel Îsraîlê asayê bikin û bi awayekî ji bertekên Amerîka dijî terorizmê xwe dûr bixin.